COTMEH 2022

KURDÎ

# TheHall

# JIN JIYAN AZADÎ




**TAYEKE PORÊ JÎNA EMÎNÎ BÛ ALA AZADÎ LI CÎHANÊ**
ERCAN DAG

**DAWIYA HIKUMRANIYA 70 SALÎ: KEYBANÛ ELIZABETH II MIR**
THE HALL KURDÎ

**13. FESTÎVALA FÎLMÊN KURDÎ BI DAWÎ HAT**
EROL BAŞAK

**DEMXEYA DAGIRKERIYÊ**
NECAT ZIVINGÎ

**SEYDA CEGERXWÎN**
KONÊ REŞ

**ANDROMEDAYÊN LI HÊVIYA PERSEUSAN IN**
SALOMÉ CIZRAWÎ

▪

TheHallkurdî
E-kovara çandî ya mehane
Hejmar 10, Cotmeh 2022

▪

**Damezrîner**
Osman Kömürcü
Erol Başak

▪

**Editor**
Erol Başak

▪

**Redaksîyon**
TheHallkurdî

▪

**Rûpelsazî**
Ridwan Xelîl
ridwanxelil@gmail.com

▪

**Bergsazî**
GrafiKURD

▪


Navnîşan
**London UK**

▪

**The Hall Kurdî**
Endama Koma
Kovargerên Kurd e

▪

www.thehallkurdi.com
thehallkurdi@gmail.com
+44 7915 413436
@KurdiHall
TheHallKurdi
The Hall Kurdî




*E-kovara The Hall Kurdî hesas e ku kovar di wextê xwe de bê weşandin.*
*Ji fikrên di gotaran de hatine parvekirin û ji rastnivîsa wan nivîskar bixwe berpirsin*
*û ne mecbûr in ku ew mîna yên weşanger û edîtor bin. Hemû gotar, nivîs, pêşgotin, reklam,*
*materyal û naverokên din bi niyeteke safî hatine amadekirin.*

# NAVEROK




**Nameya Edîtor**

Erol Başak
Rojnamevan, London
► 4



**Seyda Cegerxwîn (1903-1984) Mûsa Anter (1918-1992)**

Konê Reş
Nivîskar, Qamişlo
22



**Tayeke Porê Jîna Emînî Bû Ala Azadî Li Cîhanê**

Ercan DAG
Rojnamevan, Stenbol
► 5



**Andromedayên Ku Li Hêviya Perseusan In**

Salomé Cizrawî
Bloger, Cizîr
► 25



**Dawiya Heftê Salên Li Ser Erkê: Queen Elizabeth II Mir**

The Hall Kurdî
Kovar, London
► 9



**Hevpeyvîn Ligel Nivîskarê Ciwan Yê Rojavayî Aras Hiso**

Qesîm Etmanekî
Rojnamevan, Stenbol
► 29



**13. Festîvala Fîlmên Kurdî Ya Londonê Bi Dawî Bû**

Erol Başak
Rojnamevan, London
► 13




**Hevaltiya Jin Û Mêrên Heteroseksuel**

Rewşen Rojistanî
Nivîskar, Almanya
► 34




**Demxeya Dagirkerîyê Şoreşa Navan**

Necat Zivingî
Nivîskar, Stenbol
► 18



**Ji Qencî û Xirabîyê Wêdetir Ji Nietzsche 10 Aforîzma**

Abdullah Incekan
Wergêr, Almanya
► 38

# NAMEYA EDÎTOR

EROL BAŞAK

*Silav xwînerên delal.*

Di meha Îlonê de 2 bûyerên gelek mezin ku hêjî di rojeva cîhanê de ne qewimîn. A yekem û ji bo me Kurdan girîngtir bûyera li Îrana xopan bû. Keçeke Kurd a zor ciwan Jîna Emînî ya 22 salî bi sebeba qaşo serê xwe baş nenixumandiye û çendek tayên pora wê xuya dikirin, polîsên ehlaqê yên Tehranê ew binçav kir. Lê wan zebaniyên dojehê bi îşkence û lêdanê bûn sedema mirina Jîna ya delal. Êşa wê dilê me hemû Kurdan û mirovên bi rehm dişewitîne. Protestoyên li dijî rejîma riziyayî ya Mollayan ku bi Kurdan dest pê kir, niha li gelek deverên Îranê belav bûye. Li cîhanê jî kesên bi wijdan diçin bi xwepêşandanan nelet li wan rûreşên Îranî tînin. Me jî di vê hejmarê de berga kovarê ji bo Jîna Emînî veqetand. Rojnameger Ercan Dag li ser vê bûyerê û geşedanan nivîseke berfireh hazir kir.

Bûyera din a mûhîm jî bêguman mirina Keybanûya Brîtanyayê Elizabetha Duyem e. Elizabethê 8ê Îlonê, 2 roj piştî erêkirina serokwezîra nû ya Îngilîstanê, jiyana xwe ji dest da. Tam 70 sal li ser erkê mabû. Ji bo wê di meha 7an de pîrozbahiyên Platinum Jubiliyê hatibûn kirin. Li ser mirina wê merasîmên cinazeya wê jî 11 rojan berdewam kir. Piştî wê kurê wê Charles bû Keyê Brîtanyayê. Hûrguliyên zêdetir hûnê di vê hejmarê de bibînin.

Meha îlonê ji bo me meha festîvalê bû ya rast. 13. Festîvala Fîlmên Kurdî ya Londonê 8 rojan berdewam kir. Festîvaleke rengîn çêbû. Piştî pandemiyê yekem car li ber ekranên mezin fîlmên festîvalê hatin temaşe kirin. Agahiyên zedetir derheqê festîvalê de dîsa di kovara Cotmehê de hene.

Nivîskar Necat Zivingî di gotara xwe vê mehê de bal kişandiye ser mijareke gelek girîng û hesas. Mîna ku mamoste jî dibêje li Bakur gelek nav û paşnavên Tirkî weke Demxeya Dagirkeriyê hê jî li ser me Kurdan disekinin. Lê ya baş ew e ku êdî îmkana guhertinê heye. Necat Zivingî di gotara xwe de bi awayekî zelal rê jî nîşan dide hûnê çawa biguherînin.

Xebera xweş a vê mehê jî ev e ku nivîskar, helbestvan, lêkolîner û rewşebîrê Kurd ê Rojavayî Konê Reş êdî bi me re ye. Mamoste Konê Reş ji vê mehê pê ve dê ji kovara me re binivîse. Di vê hejmarê de wî ji me re behsa Seyda Cegerxwîn û Musa Anter kir.

Blogger Salomé Cizrawî di vê hejmarê de li ser pirsgirêkeke di navbera keçan de sekiniye: Andromedayên ku li hêviya Perseusan in. Mijara gotarê gelek muhîm e. Di vê nivîsê de ez bawerim gelek kes dê xwe bibînin.

Di kovara Cotmehê de hevpeyvîn û nivîseke xwînerên me jî hene. Qesîm Etmanekî ku xwendevanekî rojnamegeriyê ye, bi helbestvanekî ciwan ê Kurd ê Rojavayî Aras Hiso re hevpeyvîn çê kiriye. Em gelek şa bûn ku dibînin ciwanên Kurd rojnamegeriya Kurdî tercîh dikin. Dîsa ciwaneke din Rewşen Rojistanî ku li bajarê Marlburga Almanyayê xwendevan e, li ser hevaltiya jin û mêran nivîseke serkeftî bo kovara me şandiye.

Em gelek kêfxweş in ku ciwanên me bi zimanê Kurdî re eleqedar in. Dixwînin, dinivîsin û dixwazin bi vî zimanî kar bikin. Ev rûdana xweş hêviya mirov geş dike. Her bijî ji wan ciwanên bîrewer re.

*Kurdî xweş ziman e. Her pê re bin, jê nemînin.*



# TAYEKE PORÊ JÎNA EMÎNÎ BÛ ALA AZADÎ LI CÎHANÊ

**ERCAN DAG**
Rojnamevan, Stenbol
ercandagk24@gmail.com



Tayeke porê keça Kurd Jîna Emînî bû remza ala azadiyê û ev al welat bi welat li tevahiya cîhanê bi destê jinan bilind dibe. Xwepêşandanên ji bo protestokirina kuştina Jîna Emînî, tirs û agirekî mezin xist nava desthilata Komara Îslamî ya Îranê ya 43 salî.

Dengên nerazîbûnê yên li dijî kiryarên rejîma Tahranê ku roj bi roj li vî welatî zêdetir dibe nîşaneya vê yekê ye: Tu desthilata zordest û dîktatorî heta hetayê namîne, îro yan sibê dê têk biçe lê ya baqî dimîne û bi ser dikeve berxwedana bi israr a li dijî rejîmên hov e.

Bi van xwepêşandanên li Îran û Rojhilatê Kurdistanê berdewam dikin diyar e xelk tirsa perdeyê ku ev ji zêdeyî 40 salan e ji hêla rejîmê ve pêçiyayî, çirandin. Niha dor dora tirsa rejîma Komara Îslamî ya Îranê ye.

**Qêrîna Jîna Emînî Wekî Straneke Agirîn Li Tevahiya Cîhanê Olan Dide**

Jîna Emînî ya 22 salî ku ji Seqiza Rojhilatê Kurdistanê ye, di 13ê Îlona 2022an de ji bo ku serdana hin dost û nasên xwe bike diçe Tahranê. Polêsên Ehlaqê yên girêdayî Komara Îslamî ya Îranê, bi hinceta hîcaba wê bi rêkûpêk nehatiye girêdan û beşeke porê wê xuya dike bi darê zorê, bi derb û lêdan Jîna desteser dikin û dibin qereqolê.

Li gor agahiyên malbata wê û şahidên bûyerê; Jîna rastî îşkenceya polêsan tê, ji hal dikeve û sewqî nexweşxaneyê dikin. Jîna ya bi saxî tê desteserkirin piştî 3 rojan bêrih, bêgiyan ji nexweşxaneyê tê derxistin û termê wê radestî malbata wê tê kirin.


Li ser kuştina Jîna Emînî, ji bajarê wê Seqîzê heta Tahranê li giştiyê bajarên Rojhilatê Kurdistan û Îranê bi milyonan kes ku tê da Kurd, Fars, Tirk û Beluc hene li dijî rejîma Komara Îslamî radibin ser piya û serî hildidin. Protestokirina qetilkirina Jînayê ne tenê li Îranê li gelek welatên cîhanê bi çalakiyên mezin hat şermezarkirin û protestoyên li dijî rejîmê hê jî berdewam dikin. Di çalakiyan de li dijî rejîma Îranê slogan tên avêtin, daxwaza hilweşandina Komara Îslamî tê kirin û nalet li rêvebirên vê rejîmê tê anîn.

Qêrîna Jînayê ya dema dihat desteserkirin li kolanên Tahranê olan dide, niha li seranserê cîhanê olan dide.

Çîroka dilêş a Jîna Emînî risteya şa'ira navdar Furûx Ferûxzad ku dema 18 salî bû bi navê Îsyan/Bindestî nivîsî, tîne bîra mirovan:

*ber lêvên min e siya pirseke veşartî*
*ber dilê min e derdekî dilsoj û bêsitar*
*dixwazim bireşe meydanê îro bi te re*
*raza serkêşiya vî ruhê isyankar*



**Porkurkirin: Rîtuela Qedîm A Kurdan A Xemê**

Di çalakiyan de gelek jin, hem ji bo nîşandana hevxemiya xwe ya bo keça Kurd û hem jî ji bo protestokirina kiryarên li dijî azadiyê yên Îranê porê xwe diqusînin. Qusandina por an jî porkurkirin wekî rîtueleke qedîm a Kurdan a şîn û xemê tê zanîn ku niha bûye sembola protestoyên girseyî yên li cîhanê. Di sala 2014an de dema jenosîda Kurdên Êzidiyan de jî ya ji hêla DAIŞê ve pêk hatibû, jinên Êzidî ku xizmên wan hatin qetilkirin û rastî destdirêjî hatin ji ber êş û şîna xwe porê xwe kur kiribûn.

Jîna kuştin lê navê wê li gel çîroka wê ya bi êş di dil û bîra mirovan de ma. Keça Kurd bi navê xwe kete deftera ebediyetê û di dîrokê de cîh girt. Di nava du hefteyên dawîn de tenê li ser Twitterê ji 60 milyonî zêdetir navê Jînayê bi navekî din ê fermî Mahsa Emînî hatiye nivîsîn û li ser navê wê rojane 3 milyon tag (#Mahsa_Amini) (#مهسا_امینی) tê vekirin.

Piştî kuştina Jînayê ji zêdeyî 103 bajar û bajarokên Îran û Rojhilatê Kurdistanê çalakî têne kirin. Li gor agahiyên hin saziyên navdewletî bi êrîşa hêzên Îranê di xwepêşandanan de herî kêm 150 kes hatin qetilkirin, ji zêdeyî hezar kesî birîndar bûn, ji zêdeyî 2 hezarî kes jî hatine girtin. Lê tevî vê, xwepêşandêr dev ji doza xwe bernadin. Bajarên Qûm, Meşhed jî bûye cîhê xwepêşandanên li dijî rejîma Îranê ku evder wek kelha mollayên Îranê tê zanîn. Li gel vê li Kirman a ku wek bajarê jidayîkbûna serbazê navdar ê Îranî Qasim Suleymanî yê piştgirê mezin ê rejîma Tahranê bû ku du sal berê hatibû kuştin tê zanîn jî xelk çalakî kirin, wêneyên mezin ên Suleymanî û rêhevalên wî yên li meydanan qelaştin û şewitandin.

Diyar e xelkê Îran û Rojhilatê Kurdistanê, tirsa perdeyê ku ev ji zêdeyî 40 salan e ji hêla rejîmê ve pêçiyayî, çirandin û niha dor dora tirsa rejîma Komara Îslamî ya Îranê ye.

**Hîcaba Zarûrî Weke Çirayeke Manîfesto Vedigere Mollayan**

Piştî şoreşa Komara Îslamî ya sala 1979an vir de ku bi pêşengiya Ayetullah Ruhullah Xumeynî pêk hat, li Îranê qedexeye ku jin bê hîcab derkevin derva. Ji wê çaxê heta niha gelek xwepêşandan li dijî rejîmê hatin kirin ku ya herî mezin xwepêşandana sala 2019an bû bi sedemên aborî yanê bo protestokirina bihabûnên li ser benzînê hatibû kirin. Di encama wê de hezar û 500 kes hatin kuştin.

Di ser van buyeran re 3 sal derbas bûn û niha qetilkirina Jîna Emînî tê protestokirin. Ji çalakiya berê cudatir di vê çalakiya niha de bi beşdariya gelek pêkhateyên cuda yên Fars, Kurd, Tirk, Azerî, Belucî bi dirûşmeyên *"Jin, Jiyan, Azadî"*, *"Bimire Xaminêyî Dîktator"* daxwaza azadî û hilweşandina rejîma Komara Îslamî tê kirin.

Di van xwepêşandanên dawîn de yekser rejîm tê hedef-




girtin û protestokirin. Xuya ye li dijî rejîma 43 salî nerazîbûneke mezin û ji bo hilweşandina vê rejîmê îradeyeke hevbeş heye ku wekî serhildanekê ye.

Hîcaba zarûrî niha li Îranê jin ji serê xwe radikin, dişewitînin û dikin çira. Ev nîşaneya çiraya manîfesto ya dijî rejîma Mollayan e ku hîcaba jinan di destê xwe de digirin. Ji ber sedema hîcaba xwe bi rêkûpêk girênadin, tundûtijî û îşkenceyên li ser jinan zêde dibe lê beramberî vê kiryara dermirovî hêrs û berxwedana jinan û civakê jî her diçe zêdetir dibe weke niha li tevahiya cîhanê belav dibe.

**Îran Bi Êrîşa Xwe Ya Ser Kurdistanê Hewla Pûçkirina Xwepêşandanan Da Lê Bi Ser Neket**

Piştî zêdebûna xwepêşandanên li dijî rejîma Îranê, baregeh û ofîsên Partiya Demokrat a Kurdistan-Îran, Partiya Azad a Kurdistan û Komeleyên li Herêma Kurdistanê ji hêla Pasdaran a bi ser Îranê ve bi navê Xwedê û Pêxember bi moşekan hatin bordumankirin. Di encama van êrîşan de jin, zarok û peşmerge tê da 17 kes hatin qetilkirin, ji zêdeyî 50 kesî birîndar bûn û bi sedan kes ji ber bordûmana Îranê gundên xwe li cîh hiştin, koç kirin.

Îran bi vê rêbaza xwe hewl da bala xelkê bikêşîne aliyeke ku xwepêşandanên li dijî rejîmê werin jibîrkirin û aliyê Kurdan wek cudaxwaz nîşanî welatiyên xwe bide. Li gel vê bi van êrîşan partî û hêzên Kurd ên Rojhilatî bên lawazkirin da ku rojên bê di xwepêşandanan de ew partî roleke karîger û aktîf hilnedin ser xwe.

Êrîşên dawîn ên li ser Herêma Kurdistanê jî ji bo pêkanîna rizamendiyeke vê plana stratejî ya siyasî ye.

Rayedarên Îranê xwepêşandanan wek *“komplo û lîstîkên hêzên derve”* bi lêv dikin û hêzên global tohmetbar dikin. Lê ev rêbaz jî neçû serî, xelk pê nexapî, li dijî rejîmê li meydan û kolanan çalakiyên xwe didomînin. Xwendekar li zanîngehan rabûne ser piyan, sendîqayên mamosteyên Îranê ji bo grevê bang li xwendekar û mamosteyan dikin. Li gelek zanîngeh û dibistanên din biryara grevê tê cîbicîkirin. Her diçe nerazîbûna xelkê zêdetir dibe.

**Keziyê Keça Kurd Belkî Dê Bibe Benê Sêdara Zaliman**

Piştî qetilkirina Jîna Emînî li nava aliyên siyasî yên li Îranê hin nîqaş û nirxandin jî tê kirin. Bêhtir aliyên reformîst daxwaza rakirina *“Polêsên Ehlaq”*ê dikin. Bi berdewamiya rewşa halîhazir hişyariya rûdana kaoseke mezintir tê dayîn. Lê aliyê desthilat, helwesta xwe ya niha bernade û êrîşên xwe yên li ser xelkê didomîne. Tevî metirsiya zêdebûna mirina mirovan jî xelk dadikevin qadan û berxwedana xwe ya li dijî rejîmê pêl bi pêl li her deran mezintir dikin.

Siyasetmedarê reformxwaz ê Îranê Mîr Husên Mûsewî yê Serokwezîrê herî dawî yê Îranê (1981-1989) bi nameyekê bang li hemû hêzên çekdar ên Îranê dike ku li aliyê xelkê bin.

Nameya Mûsewî bi *“Keça Îranê, Keça Kurdistanê, Keça Mirovan”* dest pê dike û balê dikêşîne ser Jîna Emînî: *“Ji ber mirina wê ya dilşewat, dîroka vî welatî û esman dê biguhere. Xwîna kesên çewisandî ji zilma zaliman bihêztir e, roja kesên çewisandî, ji roja zaliman pîroztir e, ola wan ji ola sepandî û otomobîlên polîsê asayîşa civakî, ronîtir e.”*

Qerîna bindestan ku dema li tevahiya cîhanê olan bide û beramberî vê di pratîkê de îtîrazên mezin li her deran were dayîn, bêguman dîwarê desthilatên zordest jî nêzîk e ku were xware. Keça Kurd Jîna Emînî bi tayeke porê xwe, dîwarê zaliman hejand jî.

# DAWIYA HEFTÊ SALÊN LI SER ERKÊ: QUEEN ELIZABETH II MIR

**THE HALL KURDÎ**
Kovar, London








Keybanû Elizabeth a II. di 8ê Îlonê de li keleha Balmoralê jiyana xwe ji dest da. Keybanûya 96 salî tam 70 sal hikûm kir. 2 meh beriya mirina wê di Tîrmehê de 70 saliya wê ya li ser text bi navê *“Platinum Jubilee”* bi şahiyeke mezin li seranserê Brîtanyayê hatibû pîroz kirin. Ew bixwe beşdarî gelek merasîmên jubileya xwe nebû. Herî dawî li balkona Qesra Buckinghamê silav dabû xelkê li derve. Piştî wê kêliyê zêde nehatibû dîtin.

Beriya mirina wê bi 2 rojan li mala xwe ya li Balmoralê Serokwezîrê berê Boris Johnson û Serokwezîra nû hilbijartî Liz Truss qebûl kiribû.

**Rêwitiya Cinazeya Keybanûyê ya 500 mîlî**

Keybanû Elizabeth a II. li Balmorala Skotlandê jiyana xwe ji dest da. Merasîmên cinazeya wê jî yekem car li wir dest pê kir. Rewşa Keybanûyê zêde baş nebû. Jixwe jiber vê yekê di pîrozbahiyên jubileya xwe de neçûbû gelek merasîman.



Bêguman ev pirs di cî de ye ku meriv bibêje çima li paytext Londonê nemabû û çûbû Skotlandê keleha Balmoralê?

Dibe ku ev perçeyeke siyaseta îngilîzan bibe, tiştên piştî mirina wê yek bi yek hatibin plankirin. Bêguman prosedûreke fermî ji bo bûyerên wisa heye lê bi îhtîmalekê jî ji bo ku miletên keyaniyê bihevre bigrin, pêkvebûna wan xurttir bike ev rêbaz hatibe cîbicî kirin.

Keybanû Elizabehta II. di 21ê Tîrmehê de ji bo betlane û bêhnvedanê çû Balmoralê. Yên li nêzikî wê dibêjin ku keybanûyê ji vî cihî gelek hez dikir. Jixwe malûmê her kesî ye ku keybanû ji erdnîgariya Skotlandê hez dikir. Kêfa wê ji bilindahiya wan devaran re dihat. Wê Balmoralê wiha pênase dikir *“bihûşta li ser erdên bilind”*. Cara pêşî di sala 1947an de piştî ku bi Philip re zewicî ji bo honeymoonê hatibû Balmoralê. Neviyên wê dibêjin dapîra wan ji wan cihên bilind hez dikir. Tim ji bo meşê û seyranê diçû wira. Li derdora wê her tim segên wê hebûn. Ew herî zêde li wir şa bû.

Li gorî prosedûran Cinazeya wê her roj bi merasîman ji cihekî birin cihekî din.

11ê Îlonê de Cinazeya Keybanû Elizabethê ji Balmoralê hat birin Qesra Holyroodhouseyê. Cinaze li wir şevekê ma.

12ê Îlonê de cinaze ji Qesra Holyroodhouse hat birin katedrala St Giles ya li Edinburghê. Tabûta wê li vir jî rojekê ma, ji bo ku xelkê Skotlandê werin serdanê û rêzê li berê bigrin.

13ê Îlonê de cinazeya keybanûyê bi balafirê anîn paytext Londonê. Tabûta wê, wê şevê li qesra Buckinghamê ma.

14ê Îlonê de bi merasîmeke fermî tabûta keybanû Elizabeth a 2yem li ser erebeya tope ji qesra Buckinghamê ber bi qesra Westministerê derket rêwitiyeke din. Xelk jî tevlî vê meşê bû. Ji her





deverê Brîtanyayê xelk ji bo şopandina merasîman û dîtina tabûta keybanûyê herikî bû kolanên Londonê.

Li qesra Westministê tabûta Elizabeha Duyem 4 rojan ma. Ji bo ziyareta xelkê jî amadehî hatibûn kirin. Li derve qerebalixeke gelekî zêde hebû. Xelk ketibû dorê û dirêjahiya dorê ji 5 mîlê derbas kiribû. Xelk dora 14 saetan di rêzê de man. Futbolîstê navdar ê Îngilîz David Beckham jî ji bo dîtina cenazeya keybanû Elizabetha duyem 12 saetan di dorê de ma.

Bêguman ev nîşaneya hezkirin û rêzdayînê bû ji bo keybanûyê re. Hezkiriyên wê zehf bûn lê gelek kêm be jî yên wê protesto dikirin jî derketin.

Di 16ê Îlonê de dîsa li gor plana merasîman zarokên keybanûyê û di 17ê Îlonê de jî neviyên wê li ber tabûta wê ji bo nobetê sekinîn.

Sibeha 19ê Îlonê cinazeya keybanûyê vê carê ji bo merasîma dawî  hate rakirin. Navnîşan ji bo merasîma dewletê Westminister Abbey bû. Keyê nû Charlesê Sêyem di serî de hemû endamên malbata keyaniyê, serokwezîr û endamên hikûmetê hazir bûn.

Ji 168 welatan nûner beşdarî vê merasîma dîrokî bûn. Ji wan 18 monarch, 55 Serok, 25 jî Serokwezîr bûn. Ji xeynî serokê Amerikayê Joe Biden rêberên din bi balafira xwe nehatin. Ji bo ti rêberan merasîma pêşwaziyê nehate kirin. Hemû mêvan bi otobêsan veguhestin merasîma li Westminister Abbeyê.

Merasim li televîzyonan zindî hate peşkeş kirin. Herwiha kanala youtubeê ya Malbata Keyaniyê jî  bo ku li seranserê cîhanê û li welatên Comon Wealthê bê temaşekirin merasîm zindî weşand.

Cinazeya keybanû Elizabeth a duyem li keleya Windsorê di nava Şapela St George li ba mêrê wê Philip hate veşartin.

**KEYÊ NÛ CHARLESÊ III.**

Li gor qaîdeyên monarşiyê gava Key an jî Keybanûya li ser têxt bemire kur an jî keça wan ya mezin tê ser erk. Ji bo îlankirina wê tiştek hewce nîne. Bi mirina keybanû Elizabetha 2yem kurê wê Charles bû keyê nû.

Di 10ê Îlonê de li gorî qaîdeyên monarşiyê Accession Council (Konseya Tevlêbûnê) civiya. Prince Charles bi fermî wek Key Charlesê Sêyem hate îlan kirin.

Mirina Keybanûyeke mîna wê bixwe rûdana herî mezin ya cîhanê ye. Di dîroka Brîtanyayê de kesek bi qasî wê demeke dirêj, 70 sal, li ser erkê nema.

Piştî 70 salan li Brîtanyayê Keyek hate ser text. Di heyama nû de gelek tişt dê biguherin.

Guhertin bi pênasên endamên monarkê dest pê kir.

Wek qaîdeyekê monarşiya Brîtanyayê Key navê xwe diguhertin. Lê Charles nexwest navê xwe biguherîne û xwest wek KEY CHARLESSÊ III bê zanîn.

Ji aliyê din ve niha dê pereyên li brîtanyayê biguhere. Li dewsa Elizabethê êdî resm û navê Key Charlessê III. wê li ser pereyan hebe.

Kure wî Dukê Cambridgeê William di rêza textê de bû yê yekem. Piştî bavê xwe William jî bû Prîncê Walesê. Jina wî Kate Middleton jî ji vir şûnda Prînsesa Walesê ye. Gava Diana ya diya William bi Charles re zewicî bû ew jî bibû Prînsesa Walesê.

Pereyên hesin ango hûr û pereyên kaxiz jî diguherin

Ev 70 salin li ser her cure pereyên Brîtanyayê resmê Keybanû Elizabetha II. hebû. Êdî di dewsa wê de resmê Key Charlessê III. hebe. Li Îngilîstanê dest bi xebatên guhertinê hate kirin. Helbet ji nişkeva nabe ji ber ku ji bo dizaynê û vekişandina pereyên berê û bicîkirina yên nû wext divê. Tê gotin ji bo ku hemû bê guhertin 2 sal hewce ne.

**Demxe û boksên postayê dê biguherin**

Li Brîtanyayê saziya postayê Royal Mail gelek mezin û berbelav e. Hama hama li her taxê postaxaneyek heye. Ji xeynî vê jî li ser rêyan an jî li markêtên mezin boksên Royal Mailê hene. Ev wek semboleke brîtanyayêne. Û li ser wan amblema Elizabetha II. heye. Niha ewê hemû bi yên nû, bi amblema Key Charlesê III. bên guhertin.

**Sirûda Netewî**

Di sirûda netewî de gotina GOD SAVE THE QUEEN (Xwedê Keybanûyê bihêle/biparêze) dê wek GOD SAVE THE KING (Xwedê Keyî bihêle/biparêze) bê serrastkirin û xwendin.











# 13. FESTÎVALA FÎLMÊN KURDÎ YA LONDONÊ BI DAWÎ BÛ

**EROL BAŞAK**
Rojnamevan, London





**“Festival qediya lê tehma fîlmên Kurdî di devê me de ma. Em bi kelecan li benda Festîvala 14yan in”**

Festîvala Fîlmên Kurdî ya Londonê ku ji sala 2001ê vir ve heye, piştî pandemiyê cara yekem bi awayeke fîzîkî hate li darxistin. Di merasîma vekirinê de stranbêj Eléonore Fourniau bi kurdî konserteke piçûk da.

Festival 23ê Îlonê bi nîşandana fîlma *“Cîran”* ya Mano Khalil dest pê kir. Çîroka filmê li gundekî Qamislo ya li ber sînor derbas dibe. Mamosteyekî rejîmê tê dibistana gund û dixwaze zimanê erebî hînê zarokên Kurd bike û rejîmê û Esedî bi wan zarokan bi de hez kirin. Herwiha filma cîran zehmetiya ku sînorê xistiye navbera deverên kurdî jî vedibêje.

**Derhêner Mano Khalil got fîlma wan li dora 130 festîvalên navdewletî hatiye nîşandan.**

Ez gelek kêfxweşim ku hatime Londonê û fîlma cîran nîşan bidim. Di nava salek û nîv de fîlma cîran li dora 130 festîvalên navnetewî de hate nîşandan û ev sêyem festîvala Kurdî ye ku fîlma me tê nîşandan. Ew ê biçe festîvalên kurdî yên li New York, Berlîn û Hamburgê jî û di vekirinê de bê nîşandan. Heta niha fîlma Cîran 43 xelatên navnetewî standine. Xelatên yekemîniyê, xelatên sînaryoyê û lîstikvana herî baş jî tê de. Berya 36 salan gava ji Rojava çûm Çekoslavakyayê bo xwendina sînemayê bo min xewnek bû ku ez fîlmeke Kurdî çêkim. Îro festîvalên fîlmên Kurdî gelek çêbûne. Bo me serbilindahî ye. Bi rastî ez gelek kêfxweş im ku li virim.

Di festîvala îsal de Seranserê 7 rojan 15 fîlmên metrajdirêj û 16 jî yên metrajkurt bi tevahî 31 fîlm hatin nîşandan.  Piştî pandemiyê sînemahezên Kurd yekem car berê xwe dan eywanên sînemayê. Kelecan û atmosfereke xweş hebû. Lê îsal beşdarî hinek kem bû.

**Dîrektorê LKFFê Ferhan Stêrk dibêje hê jî tesîra pandemiyê li ser civakê heye.**

Ya rast beşdariya li festîvalê li gorî salên berê piçek kêm bû. Mêvanên ku hatin bi coş û kêfxweşî hatin. Girseyek hebû ku diyar bû bêriya sînemaya Kurdî kiriye û dixwest li ber ekranên mezin lê temaşe bikin. Loma li benda festîvalê mabûn û em bi wan re li ser sînemaya Kurdî axivîn. Di festîvalên berê de bi taybetî di dema seansên danê êvarê de eywan tije dibûn. Îsal em dikarin bêjin ev rêje ji sedî 80 bû. Gava em li firotina bilêtan dinêrin ev dixuyê. Seansên nava rojê temaşevan kêmtir bûn. Ji bo Sedemên vê jî wiha dikarim bêjim. Bi min ji ber pandemiya kovîdê di warê tevlêbûn û çûna çalakiyên çand û civakî de motîvasyona civakê hinek şikestiye. Sedemeke din jî bi îhtîmalekê LKFFê bi qasî ya pêwist nekarî medya û torên civakê bikarbîne.

Lê bi me re kelecan hebû. Avakirina platformeke wisa û amadekirina festîvalê û pêşkeşkirina bo xelkê tiştên herî xweş yên vî karî ne. Em gihîştin hedefa xwe. Lewra hejmara 13yan bi nîşan-







dana 31 fîlman di nav 7 rojan de pêk hat. Ji derveyê Brîtanyayê 16 mêvan hatin ji bo şopandina festîvalê. Hin ji wan derhêner bûn hin ji wan lîstikvan bûn. Ji Mîlana Italyayê hevalekî dilxwaz ji bo ku di festîvalê de bixebite hate Londonê. Ji vê hêlê ve beşdarî baş bû. Li ser fîlman gelek axaftin hatin kirin.

**Me li ser fîlman bi temaşevanan re sohbet kir, guh da rexne û pêşniyazên wan.**

Temaşekirina sînemaya kurdî li eywanên sînemayê, ji bo her fîlmê dibêjim, hesteke taybet û cuda ye. Ew mirovên ku ji heman çandê, ji heman xwezayê tên û li sînemayê li heman fîlmê temaşe dikin û li ser heman meselê wek hev hîs bikin, ev bi xwe motîvasyon û enerjiyê diafirîne. Ez hay ji vê enerjiyê me. Her çiqas ligel her kesî yek bi yek têkiliya min çênebûbe jî ez li rûyê wan vê kêfxweşiyê dibînim. Wek tîm, xebatkar û dilxwazin LKFFê ev yek me jî şad û kêfxweş dike. Civaka kurdî her tim bi şer, êrîş, binçavkirin, jiderxistin, koçberî, qetilkirina jinan û çîrokên wiha tê bibîranîn. Bêguman pirraniya fîlman derheqê meselayan de ye, divê wisa jî be. Lê tevî vê mirovên ku li fîlman temaşe kirin, karîn hêvî û êşên xwe bînin cem hev û hestên xwe bilêv bikin. Gotin çîroka fîlmê wiha dibêje lê diviya ev tiştê jî tê de hebûya, an jî diviya wisa wisa jî behs kiriba. Bi vî şiklî wan nêrînên xwe jî bi me re parve kirin. Yên hatin fîlman beşdarî panêlan jî bûn, guh dan pirs û bersivan. Wek kedkarekî vê platformê ez pê şanaz û serbilind im. Loma LKFF gelek girîng e. Hêvîdarim xebatên LKFFê berdewam bibe.

Ji xeynî nîşandana fîlman bi navê Dîroka Sînemaya Kurdî û Di Sînemaya Kurdî De Jin 2 panêl hatin li dar xistin.

Dîsa di çarçoveya festîvalê de Dîrektorê berê yê festîvalê Mehmet Aksoy hem li ber gora xwe hem jî bi bernameyeke taybet hate bibîranîn.

Galaya festîvalê û merasîma xelatan li navenda Londonê li sînemaya Prince Charles hate kirin.

Nûnerê Hikûmeta Herêma Kurdistanê li Brîtanyayê Karwan Jamal Taher, Hevserokê Kongreya Netewî ya Kurdistanê Ahmet Karamus, Parlamenterê HDPê yê Berê Osman Baydemîr, Endamê Meclîsa Harringayê Ali Ozbek gelek rojnameger û hejmareke hêja sînemahez beşdar bûn.

Di roja dawiyê de beriya merasîma xelatdayînê fîlma Zaroktiya Imad ya Zahavî Sanjavî hate temaşekirin. Film behsa çîroka zarokekî Kurd ê piçûk ku di 3 saliya xwe de ji aliyê daişî ve hatibû revandin dike. Piştî 2 sal û nîv Imad ji destê daîşê rizgar dibe. Lê Imad di destê daîşiyan de hînê kuştin û serjêkirinê bûye. Kurdî jibir kiriye, tenê erebî xeber dide. Bi zarokan re hevaltî nake û tim li wan dide. Gotina diya xwe nake. Di fîlmê de em dibînin



ku dayîka wî pir xemgîne û ji mamosteyekê derûnnas alîkarî distînin.

**Derhêner Zahavî Sanjavî dibêje ji bo kişandina vê fîlmê ew 13 mehan li kampa penaberan ya li Herêma Kurdistanê maye.**

Kişandina fîlmê gelek bi zehmet bû. Ji bo derûniya Imad em ligel derûnnasan xebitîn. Hal û tevgera Imad zor xirab bû. Di sala 2018an de Imad dayîka xwe û birayê xwe bi alîkariya dezgeheke xêrxwaziyê çûn Torontoya Kanadayê. Dapîra wî li kampê ma, lewra ew li benda mêrê xwe û 3 kurên xwe ma ku yek ji wan jî bavê Imad bû. Ew her çar jî di destê daîşê de bûn. Em serencama wan hê nizanin. Imad niha 11 salî ye, hê jî kêliyên li ba daîşîyan ji bîr nekiriye. Lê niha diçe dibistanê, guheriye û gelek şa ye. Beriya her kesî min film nîşanî Imad da. Min got heke ew hez neke ez ê li ti derê nîşan nedim. Imad piştê ku lê temaşe kir qederekî bêdeng sekinî. Piştre got fîlmê nîşan bide lê şertekî min heye. Min got çi ye? Got ji her kesî re bêje, belê ew Imad ez bûm lê ez guherîm, êdî ne wisa me. Û piştre min film bir festîvaleke fîlman a li Torontoyê nîşan da.

**Xelatên Festîvalê**

**Xeleta Belgefîlma Metrajdirêj Ya Herî Baş Mehmet Aksoy**
The Other Side of The River (Aliyê Din Ê Çem)-Antonia Killian

**Xelata Fîlma Metraj Dirêj Ya Herî Baş ya Rojazer**
The Exam (Ezmûn)- Shawkat Amîn Korkî

**Xelata Fîlma Herî Baş ya Metrajkurt ya Yimaz Gûney**
Finger Print (Şopa Tiliyê) - Zanyar Mihemmeddinîku

**Xeleta Belgefîlma Metrajkurt Ya Herî Baş ya Taha Kerîmî**
7 Symphonies Of Zagros (7 Senfoniyên Zagrosê) – Parvîs Rostamî

**Xelata Lîstikvana Herî Baş**
Şewbo Silemanî- Fîlma Finger Print
Avan Jamal- Fîlma The Exam

**Xelata Lîstikvanê Herî Baş**
Pourina Rahimi Sam- Fîlma Zalava

**Xelata Jûriyê ya Fîlma Herî Baş**
Balckberry Season (Dema Trîreşkan)- Haşîm Baydemir

**Xelata Jûriyê ya Belgefîlma Herî Baş**
My Name Is Dekan ( Navê Min Dekan) – Ala Hoshyar

**Xelata Rûmetê ya LKFFê**
Cudi of the Wishes (Cûdiyê Miradan) – Semiha Yildiz



**Peyama Derhêner Antonia Killian**

Bi fîlma The Other Side of The River (Aliyê Din Ê Çem) me xelata Mehmet aksoy wergirt. Ez pê şanaz im. Li Reqqayê di nava salekê de me film kişand. Di rojên min ên dawî yên li wir de roja ku min Mehmet nas kir hate bîra min. Me li wir li ser hêza sînemaya serhildêr suhbeteke xweş kiribû. Piştî demekê tam li wir cîhê Daîşê ew kuşt. Vîzyona wî ya sînemayê bi me re dewam dike. Hêza sînemayê bila dengê her kesê ku ji bo pêşerojeke baştir têdikoşin bilindtir bike. Jin, Jiyan, Azadî.







**Osman Baydemir-Parlamenterê HDPê yê Berê**

Pêşî ez dixwazim spasiya wan kesan dikim ku keda wan di vê festîvalê de heye. Beriya her tiştî baweriya min ev e ku miletekî bi zimanê xwe, bi çanda xwe, bi hûnera xwe kok davêje erdê. Her wiha miletê Kurd, miletê Kurdistanî miletekî herî qedîm yê cîhanê ye. Lê mixabin li her çar perçe Kurdistan dewletên dagirker dixwazin çand û hûner û zimanê kurdan asîmîle bikin, tune bikin û ji holê rakin. Li Londonê ev mîhrîcan ez bawerim bersivekê ye li dijî asîmîlasyonê û polîtîkaya asîmîlasyonê ye. Û her wiha ev mîhrîcan bingehe ku sewta Kurd û Kurdistanî îro li her çar perçe Kurdistanê, li hemû cîhanê belav bibe. Ez bawerim hûner û hûnermend wijdanên miletê xwe ne. Ez bi bîr û bawerim îro ji vê mihrîcanê, ji vê galayê wê sewta Kurd û Kurdistan, deng û behsa Kurdistan, dilê Kurdistan wê careke din derkeve holê. Ez dubare spasiya hemû kedkaran dikim. Mala wan ava be.




**Dîrektorê Lkffê Ferhan Stêrk Dibêje Ew Dixwazin Festîval Sala Bê Jî Bê Kirin**

Sala bê jî dê festîval hebe, divê hebe. Lewra fîlmên nû derketî hene. Fîlmên gelek serkeftî û bi îddîa hene. Heya fîlm hebin Festîvala Fîlmên Kurdî ya Londonê jî dê her sal hebe. Êdî festîval ne biharan lê payîzan hebe. Bi min bi festîvalê ev rê vebû. Lê rêveberiya LKFFê dê biryara vê yekê bide. Gelo festîval li meha Nîsanê bimîne an em di mehên Îlon û Cotmehê de bikin? Di vê mijarê de emê biryarekê bidin. Lê teqez festîval dê çêbe. Hêvîdar im em di çêkirina festîvalên bi coş, berfirehtir, çalaktir de berdewam bin. Em gelek tişt hîn bûn. Ji her festîvalê em tiştna hîn dibin. Em kêmasiyên xwe dibînin. Ji bo serastkirina wan amadhiyên xwe dikin.







# DEMXEYA DAGIRKERÎYÊ ŞOREŞA NAVAN

**NECAT ZIVINGÎ**
Nivîskar, Stenbol






Mirov tim dixwaze li tiştên xweş rast were, ji tiştên xirab dûr be. Bîra me çiqas paqij be dilê me ewqas rihet e. Kes tiştên nexweş bi xwe re nagerîne. Kes navê qatil û tecawizkeran li xwe nake. Kes tiştên xirabîyê bi bîr bîne, bi xwe û derdora xwe venake.

Lê hinek tişt hene me çavê xwe bi wan re vekirîye. Em li wateya wan, xweşî û nexweşîya wan nefikirîne. Nav û paşnavên me ji wan in. Ew du peyv in ku di jîyanê de herî zêde dubare dibin. Li her derê bi me re ne. Tim li ser zimanê me û derdora me ne. Me pênase dikin û ji yên din vediqetînin. Îcar ne zehmet e mirov têbigihîje bê tesîr û bandora navan çiqas zêde ye.

Nav daxwazê di xwe de hildigrin. Çawa dema mirov behsa cinan dike di cîyê navê wan de peyvên wek *"yên ji me çêtir"* bikar tîne, ji bo ji bandora xirab ya wî navî xwe biparêze, her wiha nav û paşnavên mirovan jî daxwazên qenc û xirab di xwe de dihewînin.

Damezrênerê psîkanalîzê Sîgmund Freûd di *"Totem û Tabû"*yê de balê dikişîne ser bandora navan. Li gor Lacan derbîra mirovan weke zimên xwe bi rêk dixe. Nav jî formên ziman in û derbîra mirovan dîyar dikin.

Îcar ji bo me Kurdan taybetmendîyeke din ya nav û paşnavan heye. Em miletekî bindest in û bi nav û nasnavên serdestên xwe têne pênasekirin. Li gor qanûna esasî em tirk in, di berîka




me de nasnameya tirkan ya bi alaya tirkan heye û dema em diçin dewleteke din me weke tirk dibînin. Rastî tehl e lê ev, koletî ye.

Koledarî çend hezar salan ji bo dewlemend û desthilatdaran heq hatîye dîtin û li hemî cîhanê pêk hatîye. Piştî hişyarî û hişmendî li girseyên mirovan belav bû, encex di heyama ronîdarîyê de têk çû.

Di serdema koledarîya mirovan de laşê mirovan bi hesinekî dihat demxekirin û sembolek li ser dihat çêkirin. Ji vê re *"Demxekirina mirovan"* (Human Branding) dihat gotin. Sedemê yekem destnîşankirina statûya wan mirovan û xwedîyê wan bû. Sedemekî din jî cizakirin bû.

Her çiqas cara yekem ji bo naskirin û cudakirina mirovan li Çînê berya 4500 salî paşnav hatibin bikaranîn jî, li tirkiyeyê paşnav kevneşopîyeke nû ye. Qanûna paşnavan di sala 1934an de derket. Madeya yekê bi *"Her tirk"* dest pê dike. Madeya 3yan *"navên neteweyên biyanî"* qedexe dike.

Dîyar e tirkan pêvajoya paşnavan ji bo etîketkirina cûdahîyan jî bi kar anîye. Kod ji bo hevkarên dewletê, dijminên dewletê û miletên cûda yên wek Kurd û Ermen û Rûman çêkirine.

Dema dê û bav navan li zarokên xwe datînin hêvî dikin ku ew zarok wê wateyê pêk bînin. Refleksa dewletê (bavê mezin) jî ev e. Dixwaze gelên bindest bibin tirk, jê wêdetir bibin tirkperest. Ji bo razîbûna bi tirkbûnê memûrên nifûsê navên êl û lehengên tirkan li Kurdan danîne. Pirên bîyanîyan jî ji bo ewlehîya ji êrîşên dewletê û tirkan, paşnavên wek *"Türk, Öztürk, Asiltürk, Aktürk, Yücetürk, Türkoğlu, Türkdoğan, Şentürk"* li xwe danîne. Koçberên xwestine asîmîle bibin jî, navên çanda serdest li xwe datînin.




Li gor statîstîk û rêjeyên sazîya nifûsê, li tirkiyeyê paşnavên herî zêde tên bikaranîn *"Yılmaz, Kaya, Demir, Çelik, Şahin, Yıldız, Yıldırım, Öztürk, Aydın û Özdemir"* in. Navên hişk, bêruh û tirkperest! Belkî jî yek ji sedemê hişkbûna Kurdan zêdeyîya van paşnavan e: *"Taş, Kaya, Dağ, Demir, Tunç, Polat, Er, Yiğit, Kahraman, Korkusuz, Savaş û hwd."* Hinek ji paşnavên tirkperestîyê jî *"Oğuz, Uygur, Türkmen, Turan, Cengiz, Bozkurt, Tekin, Ayyıldız, Börü, Ural"* in. Bi milyonan Kurd bi van peyvan dijîn û ji zarokên xwe re dihêlin. Wekî din jî pirên paşnavan wate xirab û pêkenî ne: *"Öcal, Kuru, Köse, Talan, Kayabaş, Kaptıkaçtı, Boynueğri, Çıplak, Çavuş, Malak, Halat, Kepçe, Susuz, Şişman, Becerir, Kütük, Canbaz, Dikoğlu, Oynak, Azgın, Yalar, Bilir, Ot, Uyumaz, Durmaz…"*

Heger ev ne kolonîzekirina hiş be, çi ye! Ya giringtir: me çima evqas ji van peyvan hez kiriye! Gelo em jê bêxeber in ku ziman mala hebûnê ye û em bivên nevên di ziman de dijîn. Pirtûkên pîroz jî vê dibêjin: *"Destpêkê gotin hebû. Gotin bi xwedê re bû. Gotin, xwedê bû."* (Destpêka Incîla Yuhanna) Di Quranê de jî piştî mirov tê afirandin: *"Xwedê, Adem fêrî navan kir."* (2/31) Pêşîyan çi xweş gotine: *"Darekê biçîne bila ber bigire, gotinekê bibêje bila ser bigire."*

Di mijara navan de yek ji bend û barîyerên dagirkerîyê jî *"axretîbûna navan"* e. Li gor vê jiberê navên Erebî axretî ne, li cem xwedê meqbûl in, yên din na! Qey zimanê xwedê tenê Erebî ye yadê? Pepûûûk! Li vê sosretê! Di rastîyê de li gor îslamîyetê jî wateya navan giring e, ne zimanê wan. Navên wateyên wan xirab, ne baş (mekroh) hatine dîtin. Di hinek mezheban de jî navên pesindarîyê ne baş (mekroh) in. Ji ber ku nabe mirov xwe bilind bike. Nexwe piştî wateya nav ne xirab û ne pesindarî be, ew nav dixwazî bi Kurdî yan Erebî be, ferqa wê tune ye. Tev axretî ne! Madem di dîn de jî rewş ev e gelo çima Steven, Agop, Josef, David, Eva û Angelîna piştî dibin misilman navekî Erebî li xwe dikin? Tew!

Bi ber bayê dagirkerîyê nekevin Kurdên xweşmirov. Hûn çima bûne pelên li ber bayê xelkê û qet napirsin: Ev rê bi ku ve diçe? Ev paşnav bi çi ve dikişe?

Pirî caran tê rexnekirin ku navê zarokan *"Delal, Azad, Berçem, Ronî, Rojda"* ye; lê ew bi tirkî diaxivin, bi Kurdî nizanin. Ev rexne ne rast e. Ger navê van zarokan *"Mehmûd, Sumeye, Cebar, Xefûr, Şuheda, Nîsa, Necmedîn"* bûna çêtir bû? Na! Wê qonaxeke din ji Kurdîtîya xwe, ji esl û sirûşta xwe dûr bûna. Qet nebe yên navê wan Kurdî ne, bi xêra navê xwe be jî wê rojekê li nasnameya xwe bipirsin. Qebehetê jibîrkirina Kurdî tenê ne dayik û bav in. Kurdî di jîyana dîjîtal û ya reel de hema bêje tune ye. Zimanên serdestan Kurdî têk dibin. Helbet divê dayik û bav sistîyê nekin; lê rastîyek heye: dayik û bav çiqas bi zarokên xwe re bi Kurdî bipeyivin jî zarok bi tirkî li wan vedigerînin. Ji ber ku ew di hemî jîyanê de tim tirkî dibînin. Televizyon, telefon, kompîter, cîran, kolan, esnaf, dibistan, otobus, metro û hwd" tev bi tirkî ne.

Di vê mijarê de xaleke balkêş jî nivîskar û rewşenbîrên Kurd in. Pirên wan navên Kurdî li xwe datînin û bi wan navan dinivîsin. Lê di nifûs û fermîyetê de demxeyên tirkan li cîyê xwe ne. Û dema ev kesayet di qadeke xuyayî de werin pêşwazîkirin an xelatkirin, bi wan nav û paşnavên tirkan deng didin.

Bi bîra xwe bînin; paşnavê Kurdên li dinyayê bi awayekî (karsazî, zanist, edebîyat, sîyaset) têne naskirin tev bi Tirkî ne. Gelo ji bo Kurdan ev ne şerm e! Tu Kurd bî, bi dehan salan ji tirkiyeyê dûr bî, li Ewrûpa û Emerîka bibî nûnerekî Kurd, lê etîketa tirkan li ser te be!

Dîsa bi bîra xwe bînin: Li dibistanê di kitêbên dersê de rûpelên destpêkê alaya tirkan û wêneyê Atatirk bû. Me wekî zarokên Kurd çi bi wan rûpelan dikir? Yan me diqetand, yan bi hev ve dizeliqand yan jî bi qelemê ew xêz dikirin heta bibin pêkenî. Ev helwesteke dij kolonyalîzmê ya me zarokên Kurd bû. Gelo bi mezinbûnê re dagirkerî û zordestîyê em têk birin? Qey êdî em mêjî-tirk in! Ew tişta me zarokan dikir, çima mezinên li

OĞUZ
TURAN
BÖRÜ





dinyayê belav bûne nakin! Çima siyasetmedarê Kurd, Ahmet Türk nake! Çima serokê İHD'yê Öztürk Türkdoğan nake!

Di mijara rakirin û avêtina demxeyan de rol û berpirsiyarîya sereke ya nûner, zana û rewşenbîrên Kurd e. Divê ew bi nasnavan qayil nebin, di nifûs û ewraqan de jî wan demxeyan nehêlin.

Heta em tişta ji destê me tê nekin, ya ji destê me nayê bi destê me nakeve. Îro em nikarin li dibistanan Kurdî bikin zimanê perwerdehîyê. Em nikarin li ser hemî lewheyan Kurdî binivîsin, hemî anonsan bi Kurdî bikin. Em nikarin alaya xwe li her derê rakin, welatê xwe rizgar bikin. Lê em dikarin nav û paşnavên tirkî biguherînin, demxeya dagirkerîyê ji ser xwe bavêjin. Em dikarin pêleke navên Kurdî (bila ev jî Navkurd be) rakin. Çima em nakin!

Zêde ne zehmet e. Li ser e-devletê *"ad-soyad"* binivîsin û ji lînka derkeve daxwaza guherandinê bikin. Ger neyê qebûlkirin li mehkemeya Aslîye Hukukê dozê vekin. Di mudeta salekê de hûnê bikarin nav û paşnavê xwe biguherînin. Hûn ne mecbûr in peyvên ku herfên *"Ê, Q, X, W"* di wan de hebin hilbijêrin. Bi hezaran peyvên Kurdî hene ku di elfabeya tirkî de nivîsîna wan pêkan e. Ha ji we re; Azad, Aram, Delal, Demhat, Raman, Robar, Zana, Zanyar…

Dibe ku ji we derbas bûbe. Lê heqê we tune ye hûn vê demxe û vî barî ji zarokên xwe re bihêlin. Pêşîyan çi xweş gotine: *"Ax û avahî, nav û navdarî"*, *"Nav ji mal çêtir e, dilxweşî ji zêr çêtir e"*, *"Ga dimire çerm dimîne, mirov dimire nav dimîne"*.



# SEYDA CEGERXWÎN (1903-1984)

**KONÊ REŞ**
Lêkolîner, Nivîskar
Qamişlo



Piştî 38 Salên Koçkirinê, Hê Jî Cegerxwîn Dibistana Ziman û Kurdewariyê Ye

Belê, piştî 38 salên koçkirinê, hêjî seyda Cegerxwîn (1903-1984) bi fikir û rewşenbîriya xwe ya jiyanê di nav me de ye. Navê wî, bi saya gotinên helbestên wî, ji nav gel nayên jibîrkirin. Ew helbestên ku rojên çetîn û dijwar derbas kirin û hê jî di nav me de amade ne, wek ku ew nemiriye. Nexasim dema ku em li gotineke Kurdî ya resen digerin, hingê em wê gotinê di nav helbestên wî de dibînin û bi taybetî ewên ku dengbîjan kirine stiran û li ser zarê her mirovekî Kurd in.

Cegerxwînê dest zêrîn.. Cegerxwînê ku bi berdewamî û bêrawestan, bi zimanê xwe yê netewî nivîsand.. Ji ziman û edebiyata gelê xwe re xizmet kir û ji dil û can xwe berda nav tev bûyerên welat û welatiyên xwe.. ta pileyeke ku mîna dibistaneke ziman û kurdewariyê tê naskirin..!

Her neh-deh dîwanên wî, li ser zîlana ferheng, gramêr, dîrok û erdnîgariya Kurdistanê dizîvirin û dizîvirin..

Erê, dengê Cegerxwîn bi kovara Hawarê re derket, lê bêtir dengê wî bi saya hebûna feqe û melayên welatparêz di nav gel de belav bû. Ji ber ku ew gund bi gund, bajar bi bajar li welatê xwe digeriya û helbstên xwe digotin. Rewşenbîr û welatparêzên wê demê jî bi hezkirineke mezin li helbestên wî guhdarî dikirin û helbestên wî ezber dikirin. Bi demê re helbestên wî ji hicrikên feqe û melayan derketin û di nav gel de belav bûn.. Gel jî, bi sîngek fireh û bi hezkirineke mezin helbestên wî pejirandin, hembêz kirin, sazbendan kirin stran û mitirban kirin dûrkên govendê.

Helbestên dîwanên wî, bi formên têvel û cihê cihê hatine hunandin ku, hêj helbestvanekî kurdî bi wiha pirrbûn helbest nenivîsandine.

Eger em helbestên Seyda Cegerxwîn li bêjingê xin, li naveroka wan ji rex Mijar, form, felsefe, huner û nûbûnê ve mêze bikin, em ê bibînin ku naveroka helbestên wî li dor van zîlanan dizîvirin:

1-Li dor rizgariya welatê wî.

2-Li dor yekîtiya gelê kurd.

3-Li dor pesnê qehreman û têkoşerên gelê Kurd.

4-Dijî kiryarên çewt yên şêx, axa, beg û dewlemendên gelê Kurd.

5-Li dor aştî û demokrasiya cîhanê.

6-Li dor têkoşîna belengaz û hejaran.

7-Şiyarkirin, pend û şîretin ji nezan re

8-Wek têkoşerekî ji bo azadiya welatê xwe, ji bo wekheviya civata xwe, ji bo avakirina cihanek aştîxwaz û ji bo serxwebûna welatê xwe nivîsandiye.

9-Helbestên wî hawar, gazin û gaziya gelê Kurd in.

Ji rexekî din ve Seyda Cegerxwîn helbestên evîndariyê jî nivîsîne, evîndariya wî jî bi du mijara ye. Yek evîndariya welatê wî ye û yek evîndariya wî a kesayetî ye, wek insan, wek mirov. Mijara dilketiya wî ya pêşî welatê wî ye. Ew welatê ku di şibhê keçekê an jinekê de aniye ber çavê xwe û helbest û sirûd li dor gotine. Mijara din evîna wî a kesayetî bixwe ye, hez kiriye, hez ji jina bedew û spehî kiriye..û wiha helbestên evîndariyê avêtine ser..

Ew yek bû ji wan kesên sereke ku bi berhemên xwe kovara Hawarê ya Mîr Celadet Alî Bedirxan dixemiland û ta rojên xwe yê dawî ma li rex welatiyên xwe bi tev kul, êş û xemên wan ve, hem jî, wî ji tev şoreşên Kurdan re helbest gotine û rojekê pênûsa xwe nekir bin xizmeta şêxekî olî an axayekî zordar, bi tenê pênûsa wî wek şûrê azadiyê bû di destê wî de, bi wî şûrî şer dikir ku xwe bighîne azadiyê.

*Cegerxwîn im ji van derda*
*Li meydanê xwe zû berda*
*Di nav bahoz û bager da*
*Bi bîr û bawer û doz im*
*Ne Şewqî û Zehawî me.*

Roja îro Cegerxwîn bûye wek stûnek zêrîn li ser zîlana helbesta kurdî, di her çar perçeyan de digere. Di wê heyama xerab de, ew heyama ku zimanê kurdî qedexe bû û kesî newêrîbû bigota kurd û ereb an kurd û tirk bira ne, Cegerxwîn helbest bi kurdî afirand û bi mêranî û dengekî bilind helbestên xwe di nav gel de gotin û belav kirin. Ta radeyeke ku gelekên wan ji nexwendiyan helbestên wî ezber kirin û di civatan de gotin û dibêjin.

Di sala 2021ê de min pirtûkek bi navê (Ez û Cegerxwîn), çap kiriye. Cegerxwînê ku temenê min 10-12 sal bûn, min navê wî bihîstiye.. Cegerxwînê ku 38 salan ve -ji roja mirina wî ve- her sal di 22ê Çêriya Pêşî de serdana gora wî dikim..

Ev pirtûka min, çîroka naskirina min bi Cegerxwîn re ye.. Digel ku min jînenîgeriya wî bi kurtî, navê berhemên wî yên çapbûyî û




çapnebûyî anîne ziman.. Wiha jî, min çend xalên giring di jiyana wî de dane naskirin wek; pêwendiyên wî bi Mîr Celadet Bedirxan, Qedrî Can û Osman Sebrî re.. Herwiha min cih daye çîrok û deqa helbesta wî, ya ku wî di pesnê Barzaniyê Nemir de gotiye. Ev helbesta ku di dîwanên wî de nehatiye belav kirin!.

Werin.. kurdino werin! Em di roja 22/10/2022an de 38 saliya koçkirina Seyda Cegerxwîn bi dengekî bilind bibîr bînin û li ser gora wî, van gotinên wî bihev re bêjin:

*Min ji bo we gelek tişt*
*Min dîwan û hin nivişt*
*Gol ji avê bûye mişt*
*Ez nizanim çi bêjim*

*Heta dil ranewestî*
*Ez nabêjim bi sistî*
*Kêr gihaye ser hestî*
*Ez nizanim çi bêjim..*

***

Rojnamevan û nivîskarê bê westan barhilgirê derd û kulê gelê Kurd, şoreşgerê ku li dijî dijmin bi pênûs û xamê disekinî, şêxê nivîskarên Kurd, apê me (Mûsa Anter: Şêxo, Şeyhmus Almas: 1918-1992), yê ku berîya 30 salî, di şeveke kembax (20-21/9/1992) de, li Diyarbekirê di taxa Seyran Tepeyê de şehîd ket.

Helbet rola pênûsa wî ne kêmî rola tivinga pêşmergeyên serê çiya bû.. Ew, bi pênûsa xwe, li rex şoreşgeran disekinî û şerê dijminê gelê Kurd dikir.. Lê xuyaye ku ew mêranî li cem dijmin nebû ku xwe li ber tîrên pênûsa wî bigrin, vêca bi bêbextî ew dane ber çend gulleyên sor da ku hew bibêje:

(Divê em Kurd li benda xelkê nemînin kes lawê bavê me tune, dive em xwe derxin rûyê dinyayê..).

Di 22yê Sibata 1992yê de, dadgeha ewlekariya Tirkî li pey hev ew bi sê gunehan tewanbar kirin:


-Yek jê, jê re gotin: Çima di sala çûyî de,1991, dema hilbijartinan tu li çend bajarên rojhilatê (Kurdistanê) geriyaye û tu li ser daxwazên gelê Kurd axifiye?!!.

-Ya dudiyan, jê re gotin: Çima te gotarek di rojnameya (Yeni Ulke) de nivîsandiye li ser êş, derd û nexweşiyên (Rojhilatê: Kurdistanê) !.

-Ya sisyan, ew li ser pirtûka ku wî (Bîranînên min) ku bi zimanê tirkî nivîsî bû dane bersivdan.. Hingê Apê Mûsa ev bersiv li dadgehvan vegerandin û got:

(..Hakimo! salê li Tirkî bi hezaran kitêb derdikevin giş bi Tirkîne, û Kemalîst in, em deynakin, çi qewimîye min jî ji salan û caran ji bo Kurdan kitêbek bi Tirkî nivîsîye..? wê çi bi dewletê bê bi vê kitêbê, heger bi vê kitêba min dewlet bihedime tê xuyakirin ku ev dewlet tewşe..).

Mûsa Anter û yên wek Mûsa Anter ne yên jibîrkirinê ne.. ku ez û te wan bibîr neynin, wê kî wan bibîr bîne? Xwedê wan bi dilovaniya xwe şad bike û serê gelê Kurd sax be.



# MÛSA ANTER (1918-1992)

**KONÊ REŞ**
Lêkolîner, Nivîskar
Qamişlo

# ANDROMEDAYÊN KU LI HÊVIYA PERSEUSAN IN

**SALOMÉ CIZRAWÎ**
Bloger, Cizîr







Bi pêşketina zanistê gelo pêdiviya ku bi mîtê, mîtolojiyê yê ku ne pozîtîf e, yekcar tune bû? Di serî de di nava termînolojiya tib û derûniyê de sembolên li ser mîtê ne, wateyeke gelekî mezin cih digire. Danûstendina mîtolojiyê û zanistê, hebûna xwe ji dema destpêka dîroka şaristaniyê û vir ve diparêze. Mîtolojî ji bo me fikirîna alternatîf, rê li ber şîrovekirina li ser zanistê vedike. Tema û şekilên anîna zimên a mîtolojiyê tevî ku li gor wext û kulturan cudahiyan di nav paxila xwe de biparêze bêyî ku bilikume, bi salan e ew dijî. Mîtolojî ji me re qala; edebiyat, huner û di ser de çîrokên li pey navên sendrom ên psîkolojîk dike. Em li ser sendromeke psîkolojîk ku navê xwe ji çîrokeke mîtolojîk wergirtiye bipeyivin: Kompleksa Andromeda.

Hûn xwe gelek caran bi yekî/yekê re bi awayekî kûr girêdayî hîs dikin, ev yek dikare di warê fînansal, hestwarî yan jî tiştekî din de be? Hûn li ser tevgerên xwe wextê ku dikevin bin berpirsyariyê, hingê hûn xwe nejîr dibînin? Wextê ku hûn û Zilamê Rast hevûdu nas bikin, hûn bi awayekî xurt difikirin ka bersiva vê pirsê dê li cihê xwe kîp be, hûn bi vê yekê bawer in? Heke bersiva we erê be, felata ji wê hestê aniha ye!

Devjêberdana di bin siya yekî de, tercîha me ya *"Bêhtir hêzdar e"*, ne ji bo nirxên *"mêr, destgirtî, malbat û mamosteyan"* divê em ji bo nirxên xwe biryar bidin. Ev yek ê cihê konfora me ji hev de bixe, bileqîne û ji bin maskeya *"mêrê baş"* yan jî *"keça min a baş"* derkevin, divê em ji bin vê gefê derkevin û ji van fîgurên otorîter derkevin, ev yek dikare ji bo tiştên me yên ku heya niha em pê hîn bûne, bibe tirsoke. Em wekî jin, tiştên ku ji me re tirsoke hatine hîskirin, ji wan bi dûr ketin, ji salên zarokatiyê û vir ve û em ber bi aliyê ewlebûyinê hatin beralîkirin. Em li ser *"Pêvegirêdanê-Piştspartinê"* hatin mezinkirin. Ji jinan re liberxwedana li hember ew dijwariyên ku bi sedan salan domiyan heya niha hatin, nehat hînkirin. Dewsa wê gazîkirina mêrekî di vê rewşa dijwar de hat elimandin. Ew tiştê ku min dixwest ez ji we re qal bikim, Kompleksa Andromeda aha bi temamî jê bidûrketina afrîneriya *"azadiyeke"* tewevar a weha ye.

Di zimanê psîkolojiyê de Andromeda; ev pênase ji bo di demên teng de jina ku ketibe dijwariyê ji berpirsyariyan bê bidûrxistin, bi gotinên xweş ên zilam ew ê bê rizgarkirin, li ser vê yekê xeyalên xweş di bîra xwe de lê difikire, tê kirin. Ev kompleks, hemû jiyana jinan difetisîne. Tahma jiyanê kêm dike. Li ser têkiliyan tixûban datîne. Bêyî li hember dijwariyan li ber xwe bide, her tim hêviyê ji mêrekî dipê. Sirf ji ber vê yekê, ji bo zewacê, dizewicin. Naxwe li pey ev tiştên ku li jor hatin behskirin kîjan hîkayeta mîtolojîk heye?

Andromeda, keça keyê Aithiopia (Etiyopya, Habeşistan) e. Keça Kepheus û Kassiepeiayê ye. Diya Andromeda ku navê wê Kassiepeia ye, bi qasî xweşikbûna xwe pozbilind e jî. Hetta ew pesneke welê li xwe dike ku, ew ji hemû keçên heyî spehîtir e, pesnê dide

ku ew ji pirepindên zeryayê Nereidlan jî xweşiktir e. Pirepindên zeryayê wextê ku vê pozbilindiya ha dibihîsin, hingê giliyê wê bi Xwedawendê Zeryayê Poseidon dikin. Li ser vê yekê Poseidon, welatê Aithiopiayê vediguherîne dike cinawirekî tirsnak û welêt bi tevahî dixe nav hev. Cetusê cinawir hemû deverî serûbinî dike.

Keyê ku vê rewşa kambax a welatê xwe dibîne, dixwaze wê ji vê rewşa kambax rizgar bike, bêgavmayî dimîne û serî li kahîn dixe. Kahîn radigihîne keye û dibêje yek çare heye ew jî divê tu keça xwe Andromeda bikî qurbana ejderha. Lê keye li hember vê yekê derdikeve. Lê herçend li hember vê yekê li ber xwe bide û vê yekê nepejirîne jî ewçend li welat rewş aloz dibe, jihevdeketin serî radike. Xelk li ser keye zorê çêdike. Paşê vê çareseriyê mecbûr qebûl dike. Andromeda dê li kêleka zeryayê bi zinaran ve bête girêdan û wekî êm bête pêşkêşî cinawir. Wê girêdidin...

Tam ê cinawir Andromeda parçe-çinî bike, Perseusê ku bi ser keyetiya Etiyopyayê re dibûre, dibîne ku keçeke xama ya ku dê ji hêla cinawirê zeryayê ve bête qurtandin bi zinaran vê girêdayî ye. Pegasus -Hespê Bipêbask- li asîman li ser Perseus difire, vedinişe erdê. Di destan de serê Gorgo Medusayê ku jêkirî ye ber bi welatê xwe ve diçe. Rewşê, bi ew tiştên ku hatine pê, qewîne dihese, ji Andromedayê re dibêje *"heke tu bi min re bizewicî ez ê te rizgar bikim."* *"Felatkarê"* Andromedayê hatiye, ew vê yekê dipejirîne. Perseus, di destan de serê Medusa (Medusa li kê feke ew vediguhere kevir.) Li hêviya cinawir e. Wextê ku cinawir tê, qafikê Medusa ber bi wî ve dizîvirîne hingê cinawir yekcar vediguhere kevir.

Aha di vê çîrokê de; Perseusê ku bi hespê xwe yê bipêbask ê boz ve hatiye, dibe prototîpê çîrokê yên serdema nûjen ê *"Prensê Bi Hespê Boz"*. Andromeda jî keçên xama yên ku bendewarên felatê ne. Ew jinên ku wan bawerî û pêdivî bi zilamekî û hêza wan aniye, ew Andromedayên ku wan bawerî bi pêdiviya hêza mêrekî anîne. Hê wextê ku ew zarok in, çîrokên ku qal lê tê kirin, di nav çîrokê de karaktera jar a ku pêdivî bi hêza prensekî xwedanhespekî boz heye prensesek e. Prenses ne xwedanhêzeke ku dê bi qîma hemû çareserkirina probleman hebe. Ew ne hêzdar e. Keçên ku bi van hîkayetan mezin dibin, di pêşerojê de xwe naspêrin ber berpirsyariyên jiyana xwe û heya roja zewacê xwe dîl hîs dikin û li hêviya prensê xwe yê xwedanhespekî boz, disekinin. Lewma jî navê din ê vê sendromê yê ku tê zanîn Sendroma Cinderella ye.


Gelekî jinên ku wan haye ji vê sendromê heye aya nîn e welê bi vî awayî, bi Kompleksa Andromeda ve dijî. Lê ev yek rê li ber jiyaneke azad a ku bêyî daxwazîlêkirina hêza mêrekî, digire. Nahêle bi pêş ve biçe. Xwepêvegirêdan xwe dide hev.













Paşê jina ku xwe pê ve girêdaye bi temamî dikeve bin, bindestiyê. Ew jinên ku bêrî li azadiyê dikin û li encamên wê ditirsin, di wê rewşa azadîxwaziyê de wan yekcar têk dibe, navê vê yekê Andromeda ye.

Colette Dowling welê dibêje *“Ji em jin weha hatin elimandin, jin bi tena serê xwe nikarin li ser piyan bisekinin. Ew pir hassas û narîn in, ew divê werin parastin. Niha jî di van rojên ronakbîriyê, ronakbîrên me welê bi me didin zanîn ku jin divê bi xwe li ser piyan bisekine, hingê jî pirsgirêkên neçareserbûyî tên pê û ev ên ha me ber bi jêr ve dikişînin. Di heman demê de em bêriya hem dixwazin bêyî ku bi yekî ve girêdayî bin, azad bin bijîn hem jî em dixwazin yek di jiyana me de bibe xwedanberpirsyar û em bijîn, dikin.”* Divê em li vê nakokiya kûr û hatiye înkarkirin bifikirin, jê nerevin û divê em bizanibin ku *“felatkarê”* rasteqîn em bi xwe ne. Divê em pêşî ji mêjî û dilê xwe dest pê kin û daxwaziyê li azadiyê bikin. Ma navê ku em rabin pengavê û gavekê biavêjin wî aliyê din ê vê klîşeyê?

Rê li ber normên civakî yên tîpîk bigirin da ew hikumê li daxwazên we nekin. Jixwe însan ê we bidarazîne hetta ku hûn *“ya herî baş”* pêk bînin jî. Lewma jî hûn divê rexnegirên bikêrnehatî piştguh bikin, heke hûn vê yekê hîn bibin ê bi kêrî we bê. Ji tixûbên xwe yên konforê derkevin. Serpêhatîparêz bin. Bêtir afirinde bin. Bêtir henekbaz bin. Tiştên nû biceribînin. Li tiştên ku heyî ne nefikirin. Tiştên nûtir bifikirin û wan biparêzin. Ceribandinê bidomînin. Tiştên ku bêne keşifandin gelek in. Kêmaniyên xwe bipejirînin û bi qîma wan bên. Helbet hewcedarî bi destekgiriyê dê hebe. Helbet pêdiviya me dê carina bi danûstendin û fikrine hebe. Ji bo xwe biryardayinê hin bin û wêrek bin li hember encamên berpirsyariyên xwe. Haye ji xwe hebin, qedrê xwe bigirin. Qet tu carî lêfikirîna bêhempa ya hevruhekî ne çewt e. Lê fikra bêyî yekî meriv bi qîma xwe neyê çewt e. Navê ku em li hêviya felatkarekî bin. Em berpirsyarên xwe ne û ji bo felatkariya xwe em bi qîma xwe ne.



# HEVPEYVÎN LIGEL NIVÎSKARÊ CIWAN YÊ ROJAVAYÎ ARAS HISO

**Qesîm Etmanekî**
Rojnamevan, Stenbol

*“Geşedana Qozikdayîna Pênûsa Min bi Nivîsandinê re Bêguman Şoreşa Rojava ye!”*

*Aras Hiso*

Piştî Bihara Erebî û şerê bi DAIŞê re, li Rojavayê Kurdistanê Kurd li ser axa xwe bûn xwedî desthilatdar. Bûyerên ku li Rojava qewimîn helbet bi xwe re gelek tiştên erênî û neyênî jî anîn. Em dixwazin di vê hevpeyvînê de li ser tiştên erênî bisekinin û bala we bikşînin li ser serpêhatiya ciwanekî li bajerê Kobanî.

Li Rojava yek ji van tiştên erênî di nav Wêjeya Kurdî de pêkhat. Piştî alozî û şerê li Rojava çêbûn, di nav ciwanên Kurdan de berê berê hewleke edebî rû da. Gelek ciwanan berê xwe dan Kurdiyê û bi zimanê xwe wêjeyê afirandin, berheman çapkirin. Yek ji wan ciwan jî Aras Hiso ye ku ew xelqê bajarê Kobaniyê ye.

Aras Hiso, helbestvan û nivîskarekî Kurd e, di sala 1996an de li Rojavayê Kurdistanê li bajarê Kobanî ji dayîk bûye. Ew, ji sala 2012an ve mamostetiya Ziman û Wêjeya Kurdî li Saziya Zimanê Kurdî (SZK), Dibistan, Peymangeh û Akademiyê kiriye û niha jî di Zanîngeha Kobanî de mamostetiya Wêjeya Kurdî dike. Her wiha di heman zanîngehê de mastira Ziman û Wêjeya Kurdî dixwîne.

Hiso, ji ber mijûlbûyîn û behremendiya xwe ya bi wêjeyê re hejmarek çîrok, pexşan û helbest nivîsandiye û ew di kovarên mîna Pênûsa Ziman, Şermola û Sîwanê de hatine weşandin. Berhemên wî ên ku heta niha hatine çapkirin; Ji Qehra Guliyên Te (Helbest, Weşanên HRRK, Qamişlo 2019), Çirûskek ji berxwedana Kobanî (Çîrok, Hevbeş, W. Şilêr, Qamişlo 2016 û W. Aryen a li Bakurê Kurdistanê, 2017) û Rodî û Perwîn (Helbest û pexşan, Hevbeş, Qamişlo, W. Şilêr, 2020) in. Her wiha Hiso da zanîn ku berhemeke wî a kurteçîrokan ya bi navê ‘’Xwelî’’ ji aliyê Weşanên Ava ve li ber çapê ye.



Hêjayê gotinê ye ku Hiso, sala par di pêşbirka helbesta ya ciwanan a Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK) de xelata helbestê ya yekemîn wergirt û wî gelek caran jî beşdarî festîvalên wêjeyî yên mîna Viyan Amara û Osman Sebrî kiriye.

Em di vê hevpeyvînê de li ser nivîsandina berhemên wêjeyî, çavkaniyên afirandina wan, girîngiya bajarê Kobaniyê û gelek mijarên din bi Aras Hiso re axivîn.




▶Aras Hiso dema di şahiya HRRKê helbestên xwe dixwîne

**Ez dixwazim pêşî ji vê pirsê dest pê bikim; têkiliya te çawa bi nivîsîna berhemên wêjeyî çêbû, gelo çi di jiyana te de qewimî ku te dest bi nivîsînê kir?**

Destpêkê ez destxweşiyê ji bo cenabê te dikim, ji bo vê hevpeyvînê. Geşedanên qozikdayîna pênûsa min bi nivîsandinê re bêguman sedema wê ya sereke şoreşa Rojavayê Kurdistanê ye. Ji xwe hûn jî dizanin şoreşa Rojavayê Kurdistanê çi ji aliyê siyasî, civakî û zihnî ve û çi jî ji aliyê çandî û wêjeyî ve bandoreke mezin çê kir. Yek ji wan destkeftiyan Saziya Zimanê Kurdî di salên 2012an û şûn ve dest bi vekirina kursên zimanê Kurdî kir û ji wir û şûn ve êdî pêlên vekirina sazî û dezgehên saziyên zimanê Kurdî li hemû bajar û gundewarên Rojavayê Kurdistanê re hate destpêkirin.

Ji aliyekî din ve gava ku êdî dor li bajarê min Kobaniyê hate tengkirin, çiku wê demê hemû saziyên dewletê ji bajarên Rojavayê hatin derxistin, ew jî bû sedem ku ez nekaribim xwendina xwe berdewam bikim. Lê bi xêra vê şoreşê min karibû hem xwe li ser zimanê dayîkê perwerde û kûrtir bikim, hem jî bikaribim bi wî temenê biçûk de dest bi fêrkirina zimanê Kurdî bikim.

Di warê nivîsînê de jî, sebeba herî destpêkê xwendin bû. Min gelek ji xwendina pirtûkan hez dikir û min gelek caran metnên roman, helbest û çîrokan bi xwendekarên xwe re parve dikirin. Ji hukmê xwendina pir ya pirtûkan re ew hewesekariya nivîsandinê li gel min dest pê kir. Lewma jî min ji nivîsandina helbest, pexşan û tekstên biçûk dest bi nivîsandinê kir, tevî ku min bi rêzik û qalibên nivîsandinê nedizanî, lê bi xêra xwendina pirtûkan ew warê nivîsandinê di serê min de roj bi roj mezintir dibû.

**Di her karê hunerî de bêguman bandora kesayetên berê çi kêm çi zêde çêdibin, gelo wêjeya ku tu diafirînî de tesîra nivîskarên Kurd an ên biyaniyan heye an na?**

Ev mesela bandorbûyînê jî bêguman li ser mirovan, nivîskar û hunermendan çêdibin. Di warê helbestê de bandora helbestvanên mîna Rênas Jiyan, Ehmedê Huseyînî û Arjen Arî bêhtir li ser berhemên min hebûn, çiku wan helbestên gelekî hêja bi teknîkên ciyawaz dinivîsandin. Di warê roman û çîrokan de jî nivîskarên mîna Mehmed Uzun, Hesenê Metê, Helîm Yûsiv bêhtir bandora wan li ser xwendekariya min heye, çiku ez dikarim bêjim bi rastî em bi berhemên van nivîskaran xwedî û mezin bûn û hîn jî pê mezin dibin.

Ji bo nivîskarên biyanî jî bi rastî ez nikarim bêjim heta çi radeya bandora wan li ser berhemên min hebûn an na, lê ez dikarim bêjim berhemên ku herî pir min ji wan hez dikir û dixwendin yên nivîskarên mîna Kafka, Gogol û Çehov bûn.

**Meriv bi rihetî dikare bibêje ku Hawar û Ronahî û ekolên ku li Suriyê derketin li ser wêjeya Kurdiya Kurmancî bandoreke mezin çêkirin, tu wek nivîskarekî Kurd vê mijarê çawa dinirxînî? Gelo li ser wêjeya ku tu jî diafirînî bandorek wan heye an na?**

Helbet ev du metodên sereke ne ku îro di qada Wê-

jeya Kurdî de em xwe pê dibînin û mîna gencîne û çavkaniyekê ne ji wêjeya nûjen a Kurdî re. Hawar û Ronahî di dewra xwe de bi riya nivîskarên mîna Celadet Bedirxan, Kamîran Bediran, Qedrî Can, Osman Sebrî, Nûredîn Zaza û gelek nivîskarên din bi serê xwe şoreşek li dar xistin ku em îro bi saya wê şoreşê pişta xwe pê germ dikin. Bi rastî ez nikarim bêjim ku bi awayekî yekser ew bandor li ser tekst, nivîs an afrêneriya min heye yan na, lê ez dikarim bêjim ku bi awayekî rasterast di warê dersên me yên wêjeyî de her demê lê vedigerin û ji xwe re mîna lêvegere wêjeyî, çandî û zanyarî didît. Gava ku me dest bi mastira xwe ya Ziman û Wêjeya Kurdî di Zanîngeha Kobaniyê dikir, ku hîna jî berdewam lê dixwînin, em her demê Hawar, Ronahiyê û heta bi Rojnameya Kurdistanê û gelekên din lê vedigeriyan, çiku ev xwendin di lêkolînên me yên wêjeyî de lazim bûn. Lewma dikarim bêjim bandorbûyîna wê bêhtir di aliyê xwendin û lêkolîneriyê de ye.

**“Miştenûr ji bo Hemû Kobaniyan Cihekî Pîroz e”**

**Bêguman ji bo nivîskaran kaniyên afirandina berhemên wêjeyî gelekî girîng in. Di vê mijarê de dixwazim rola Kobanî û bi taybetî jî girîngiya Miştenûrê(di çend helbestên te de min vê navê bihîstibû, ji ber vê min xwest vê jî bipirsim) bo te bizanibim?**

War û axa ku mirov lê dijî bêguman ew ê bandorê ne li nivîsên wî, ew ê bandorê li jiyan û pêşeroja wî jî bike. Kobanî û ew kolanên ku lê mezin bûmê, bêguman di binhişê min de mîna taployekê ku qet li ser sawîrên min naçe. Ez bawer im ev yek bo hemû nivîskarên Kurd wiha ye, jîngeha ku nivîskar lê mezin dibe, xwe di hundirê metnên wî de jî dide der. Miştenûr, ne tenê ji bo min, ji bo hemû Kobaniyan jî cihekî pîroz e; ya yekem ew cihekî bilind e ku hemû bajar li ser tê xûyakirin û berê li wir darek hebû hemû xelkên Kobaniyê diçûn benek bi wê darê de girêdidan da ku Xwedê mirazên wan pêk bîne, lewma mîna ziyaretgehê bû. Ya duyem jî gava ku di sala 2014an de çeteyên DAIŞê li dora Kobaniyê bûne girêk, wê hingê Miştenûr bû stargeh ji şervanên YPG û YPJê re, me jî ji dûr ve dişopand ku çawa dûman li bilindahiyê Miştenûrê radibû, ji wê zêdetir ji ber ku şervana YPJê Arîn Mîrkan di 5ê Mijdara 2014an de xwe di nava rûçikê çeteyan de teqand, hingê ew ax û Miştenûra ku bi xwîn û cesedê wê re têkilhev bû, pîroz ma. Di bajarekî ku mirov lê mezin bibe zêdetir, bajarekî bi şer, ceng, tunebûn, birçîbûn, azarî û bêhn axê têkilhev bûbe, ew ê bêguman li ser rûpelan were meydandin û bibe çavkaniya afrêneriya mirovî.

**Cenabê te jî dizane ku ji Seydayê Xanî heta dema ku em îro dijîn, bazara Kurdî (nexasim a Kurmancî) her kesat e, gelo fikrekê te yê cuda hebû ku tu ji xeynî Kurdî bi zimaneke biyanî jî binivîsînî, bo mînak zimanê Erebî?**

Te anî bîra min ku ez bibêjim, ji xwe serdema klasîk qonaxekî gelek berfireh di Wêjeya Kurdî de digire, ji wan helbestkar û rewşenbîrên mîna Cizîrî, Xanî û Feqî jî bi helbestên xwe bandoreke gelek mezin li min kirin. Lewma ew beyta Cizîrî ya navdar ku tê de dibêje, *‘’Ger luluyê mensûrî ji nezmê tu bixwazî, wer şiîrê Melê bîn, te bi Şîrazî çi hacet”* yanî ew zimanê xweş û şîrîn çima em jê dûr bikevin û bi zimanekî din binivîsîn, madem zimanê Kurdî heye û ne kêmî zimanên din e, gelo sebeb bindestiya me Kurdan e? Bi rastî ez ne li dijî zimanên din im, hinekî nivîskarên kurd li rex zimanê Kurdî bi zimanê din yê mîna erebî û tirkî dinivîsin, lê zimanê xwe di asta pêşîn de dibînin. Hinek nivîskarên me Kurdan jî hene, tew bi Kurdî jî nizanin. Mixabin ev yek li gel me Kurdan hîna bi nakok e.

Tu fikrên min tune ku zimanekî din binivîsim, divê ku ez li xwe mikûr werim, dibe ku zimanê pêşîn ku ez pê mezin bûme û nivîsandiye Kurdî(Kurmancî) ye, lewma fikreke wisa neyê min e, di heman demê ew şansê min e ku ez pê kêfxweş dibim û zimanê pê mezin bûme Kurdî ye. Ji ber ku îro gelek hevalên min hene bi zimanê Erebî dest bi jiyan û xwendinê kirin, gava ku tên ser zimanê Erebî di warê têgihiştin û nivîsandinê gelek astengiyan dikşînin. Helbet ev nerîna min e, ez ji aliyê xwe ve wiha dibînim. Serê pêşîn zimanê mirov, hingê zimanên din tê.

**"Em ê li Rojava Tiştên Xweşiktir Bikin"**

**Ez wek xwendevanekî Wêjeya Kurdî vê tiştî meraq dikim; gelo em gelê me yê Bakurî dê bikaribin di siberojê de berhemên ku te afirandine li vê parçeyê welatê xwe jî bixwînin, gelo dê derfet hebe ku tu berhemên xwe li Bakur jî çap bikî? An jî hêvî û daxwazeke te yê wisa heye?**

Bi rastî destpêkê dixwazim bêjim, ez bi xwe hîn nivîskarekî ciwan û hîn di destpêka temenê nivîskariyê de me û hez dikim ew hewesekariya nivîsandinê li gel min mezintir bibe, çima nebe ez jî bibim nivîskarekî di qada Wêjeya Kurdî û heta bi cîhanê de werim naskirin, lê qewla bav û kalan her tişt bi sebrê pêkan e. Ger Xwedê bike dixwazim berhemên min li parçeyê Bakur û yên din jî were belav kirin, di heman demê de ji bo ku têkilî di navbera nivîskarên Rojava û yên Bakurê Kuristanê û heta bi parçeyên din de geş û xurt bike. Ji xwe ev hewldan hene jî, ku di navbera me û nivîskarên Bakur û heta Başûr de carinan çêdibe. Her wiha berhemeke me ya hevbeş a kurteçîrokan ku min û çend hevalên xwe bi hev re bi navê ''Çirûskek ji berxwedana Kobanê'' ji nav Weşanên Aryen li Bakurê Kurdistanê û Tirkiye belav bû. Ger ev aloziya bi ser serê me li Rojavayê Kurdistanê rabe, em ê gelek tiştên xweştir bikin.

**Dawiya hevpeyvînê de dixwazim vê jî ji te bipirsim; piştî berhemên ku te çap kirin, di demekê nêzîk de, dê berhemeke nû jî bigihije xwîneran?**

Ji xwe niha li kêleka xwendina xwe ya mastirê, ez li ser berhemeke kurteçîrokan dixebitim ku ew jî qala bûyer, derbiderî, rûdan û êşên Rojavayê Kurdistanê dike, ger ew xelas bibe û Xwedê bike qismet ez ê biweşînim.

**Ji bo vê hevpeyvînê sipasiya cenabê te dikim.**

Ez jî gelek spasiya te dikim, tu her hebî.



# HEVALTIYA JIN Û MÊRÊN HETEROSEKSUEL

**REWŞEN ROJISTANÎ**
Nivîskar, Almanya







**Pirsek girîng e, gelo jin û mêr dikarin bibin hevalên sosyal?**

Li bakurê Kurdistanê bi salan keç û kur bi hev re ji baxçeyê zarokan heta xwendina bilind, bi hev re perwerde dibin. Têkiliya jin û mêran ji zaroktiya 4-5 salî dest pê dike. Lê belê hin kesên ku hevaltiya sosyal ya jin û mêran napejirînin jî hene. Sedem jî ev e ku jin û mêr du cemserên dijberî hev in û dema di civatê de bikevin têkiliya nêz, hevdu dikişînin, di bin têsîra hev de dimînin.

**Jin û mêrên heteroseksual nikarin bibin heval?**

Rast e ku jin û mêr hevdu dikişînin. Li gor bijîşk û derûnnasan hormonên mêran li gor yên jinan zûtir çalak dibin û mêr ji jinan zûtir tahrîk dibin. Eger wisa nebûya têkiliyên cinsî û raketina jin û mêran zehmettir dibû ku ev jî pewistiyeke gerdûnî ye ku mirov zêde bibin û tertîba xwezayê bidomînin.

Ew qanûna xwezayê ye, du cemserên dijber, her dem hevdu dikişînin. Wek (–) û (+). Lê belê gelo em mirov, dema bixwazin xwe têxin nav civakeke heterojen nikarin xwe notr bikin?

Wek pîr û kalên me dibêjin, ma mirov nikare li nefsa xwe xwedî derkeve?

Ez di vê baweriyê de me ku ev bi perwerdehiyê ve girêdayî ye û mirov dikare xwe perwerde bike û xwe notratîze bike ji bo du zayendên sereke - jin û mêr- bikaribin têkiliyên asayî yên sosyal bi hev re dêyînin.

Di çanda misilmantiyê de jin û mêr ji bilî kesên ku zewaca wan çênebe ji hev re heram in û nikarin li cem kesên ku dikarin bi wan re bizewicin xwe bêyî nixwumandin bidin pêşberî çavan. Eger ev rast be û ola Islamê vê rastiyê hezar sale dibeje, naxwe jin, dive xwe ji mêran dûr bixin heta xwe hicab bikin ku jin xwe ji tahrik bûn û istismarbûna mêran biparêzin!

Hezar sal e ola Îslamê vê rastiyê tîne ziman ji xwe, naxwe em li çi digerin? Femînist û rojavayî bahsa çi dikin?

Eger cil û berg azadiya jinan be, em çima ji ber nefsa mêran tên asteng kirin?

Naxwe ev ne neheqî ye ku li jinan tê kirin?

Ez dixwazim di vê nivîsê de bi awayekî bersiva van pirsan bidim.

Dem diguhere û di demê de pêdiviyên mirovahiyê jî diguherin. Her sedsal mirov jî diguherin li gor pêdiviyên sadsala xwe. Pêdiviyên mirovahiyê jî tên guherîn. Hezar sal berê heta di nav civaka rojavayiyan de jî dixwestin ku bizanin berî zewacê ka keçek bi mêrekî re ketiye têkilîya cinsî û ji kesek din ducanî ye yan na. Baş e, ev tedbîrek hem ji bo jin hem ji bo mêran bû lê hezar sal berê .

Lê niha tevî ku zanist pêşketiye û testa DNA derketiye, çima hîna jî civak ji bo vê meseleyê eziyetê li jinan dike?

Çima têkiliya cinsî ji bo jinan wek ya mêran rahet nîne û dixwazin keç yan jin *"destlênehetî"* be heta ji mêrekî pê bawer bibe - zewacê- helbet û êdî bibe xwedî tecrûbeyeke cinsî.

Ev hemû ji bo çi ne? Ji bo parastina jinan? Lê ji ber kê? Ji ber mêran? Ev hemû nakokiyên civakê ne.

Civak bi xwe jî nizane dixwaze çi bike. Di heman demê de piştgiriya du fikrên dijber dike

ku ev jî li gor nivîskarê navdar George Orwell nexweşiya *"doublethink"* e. Dawî bi xwe jî nizanin kîjan fikrî dipejirînin.

Problem ev e ku mirov zû nikarin guherînan qebûl bikin û xwe zû adapteyî rewşên nû bikin ango senkronîze bibin. Di rastiyê de naxwazin ji qada xwe ya rehet ya bêteşqele derkevin. Ez dibêjim teşqele, ji ber guherînê teşqeleyek e. Mirov divê berî hemûyan bipejirîne ku dive xwe biguherîne, dest bi maweyeke nû ya hundirîn bike, ji ber ku guherîn ji hundir dest pê dike. Ev zehmet e helbet mirov dev ji hînbûnên xwe, edetên xwe berde. Ya herî zehmettirîn ev e ku mirov mantelîteya xwe an go şêweya fikirîna xwe biguherîne. Ev kar sebr dixwaze ji ber ku gelek wext û enerjîya mêjî jê re pêwist e.

Di serdema ku hemû tişt gelek hêsanbû ye de êdî mirovahî naxwaze bifikire, analîz bike û pirsan bipirse. Ji ber naxwazin jimnastîka mêjî bikin û xwe biwestînin. Fikirîn jî bi awayekî werzîş e. Mirov dema difikire analîzan dike, kêmasî û xetayan dibîne, pirs jî ji wan analîzan dertên. Wê çaxê mêjiyekî ne aram, bi pirsan ve mijûl, li bersivan digerê heye. Morîkên kê qetiyaye ku ewqas eziyet bide xwe? Hema çawa me dîtiye em ê wisa bikin, çi pêwistiya me bi serêşiyê heye!

Ji xwe wek millet em ti karê xwe bi baldarî û dîsîplîn nakin. Hemû karên me wisa astarî an go serveyî ne. Xwedê zêdetir



bike, tevî ku ewqas partiyên me yên siyasî hene, hîna jî em miletekî li çar dewletan debeşkirî ne!

**Ka ciddiyet ka baldarî?**

Tu kes di karê xwe de ne cidî û baldar e ne jî xwedî dîsîplîn e. Baldarî giring e, her kesê ku xwest divê nikaribe tevlî me bibe. Dema em dozekê diparêzin divê deriyê me ji her kesî re nevekirîbe, yê hat, hat yê çû, çû!

Kesên tevlî me dibin divê em baş li wan vekolin. Dibe ku sîxûrek be, dixwaze fitne û fesadiyê bixe nav me, yan me ji dijminê me re deşîfre dike. Ji ber ku hemû karên xwe wisa bê dîsîplîn û ciddiyet dikin normal e ku êdî civak baweriya xwe bi partiyên xwe neyîne. Gel wek ku paranoya bi wan re heye êdî ji xwe jî şikê dike.

Lê ev meseleyeke din e!

Dema mirov nefikire û li pey kevneşopiyên berê biçe, mirov jî civak jî paş de diçe. Ku dewlet nebe, zimanekî hevgirtî nebe civak çawa ji hev fam bike û xwe nû bike û pêş bixe?

Bi taybetî jî dema ku dagirkerek ku bi taybetî dixwaze milletekî di tarîtiyê de û di nav lepên nezaniyê de bihêle hebe, pêşketin, ronakbûn ji bo wî milletî zehmettir dibe.

**Em van hemûyan dizanin lê em çima destûrê didin ku me bixapînin?**

Mirov hîna takakes in yanî hemûkes dibeje ez. Kêm kes bûne xwedî hişmediya netewebûn e.

Êşandin jî êşandin e! Mirov divê bi rastî xwe biêşîne. Kes jî mixabin naxwaze xwe biêşîne. Di civakek birçî û belengaz de mirov fikrên ideolojîyan nakin. Li têrkirina zikê xwe û şîva xwe difikirin. Kesekî birçî nikare bifikire û di pey ideolojiyan de biçe. Kesekî birçî



tenê li xwe difikire ku ev jî reflekseke aîdî hemû candaran e. Ji bo bijîn xwe diparêzin. Fikirîn, enerjî û zikekî têr dixwaze.

Naxwe problem nexwestina guherînê bixwe ye.

**Mirov birastî ji ber cudahiya cinsî nikarin bibin heval?**

Ez di vê baweriyê de me ku mirovahî çiqasî pêş dikeve û serdem diguhere fersendên pêşketinê jî dikevin destê mirovan. Mirov nikare rastiya xwezayê paş guh bike, lê mirov dikare xwe perwerde bike xwe biparêze. Hemû tişt perwerde û hînbûn e. Ji roja ku em ji dayik dibin ve em qanûnên ne nivîskî û yên nivîskî hîn dibin. Em divê çawa rabin, rûnin, bixwin, heta çawa biçin avdestê…

Bo nimûne kes naçe li derve pêş çavê mirovan mîz nake, ew jî hînbûne ango perwerdebûne ku mirov di serdemeke hîn gelekî zû, zaroktiyê de hîn dibe. Keç û kur dizanin ku divê derên xwe yên cinsî hin ji serdema kevin ve binixumînin.

Ev hemû perwerdehî ne. Di nav civakên pêşketî de ev pirsgirêk nîn e. Civak ji bo guherînê amade ye û jixwe guherî ye. Ev mawe bi saxî derbas kirine. Mirov dikare hîn bibe xwe kontrol bike, têkeve nav danûstandineke insanî.

**Dibe ku ev pirs bê bîra mirov; çima jin û mêr divê danûstandinê bikin?**

Ev jî jixwe bersiva pirsê ye. Ji ber ku jin û mêr ji hev cuda ne. Cudahiya fîzyolojîk dibe sedem ku jin û mêr bi temamî ji hev cuda bibin. Fîzyolojî û şêweya fikirîna wan heta hêstkirina wan ji hev cuda ye. Jin bi piranî li detayan difikirin ji ber ku li gor lêkolînên norologan mêjiyê jinan komplekstir e. Mêjiyê jinê algorîtmayek kompleks e. Jin dema li tiştekî dinêrin bi awayekî komplekstir dibînin û dema jin û mêr li heman tiştî dinêrin û tiştên ji hev gelekî cuda dibînin ev lihevnekirineke di navbera du zayendan de çêdike. Jin gelekî hêstyar in ji ber ku jin dibe dayik, jin estetîk e hûner e. Mêr hinek din serpilkî difikirin û *“tiştan”* wek jinan kompleks nabînin. Ditîn û dinyaya wan sadetir û serê wan rehettir e. Lewma mêr dikarin xet û sînorên giştî baştir bibînin û li wan fokus bibin. Dema meyla aliyekî detayan bibîne û aliyê din xetên giştî bibîne, ev herdu alî dikarin hev du temam û kamil bikin. Civak jixwe dixwaze pêdiviyên mirovan yên xwezayî asteng bike. Dema ew tên astengkirin pêdiviyên ku pêk nehatiye li ser mirov birçîbûnekê çêdike. Eger pêdiviyên mirovan nehatibin pêkanîn ev problem dertê holê. Maslow jî behsa hiyerarşiya hewcedariyan dike ku têkiliyên zayendî jî yek ji hewcedariya bingehîn e, wek xwarin û vexwarinê. Dema mirov li ser baweriyên hezar sal berê biçe jin û mêran asteng bike, gengaz e jin û mêr nikaribin di nav civakê de têkiliyeke sosyal ya asayî ava bikin. Yan ji bo jin û mêrekî têkiliyên civakî dideynin bi çavê teqez wê bizewicin tê meyzîn, yan jî dive ji bo jin û mêran gerdûnên cuda hebin.

Lê belê em bi dijberiyan xweşik in û rengekî cuda didine gerdûnê û av herikbare û yê biherike nabe bê astengkirin. -30.08.2022

# JI QENCÎ Û XIRABÎYÊ WÊDETIR

Ji Nietzsche 10 Aforîzma

Werger: **Abdullah Incekan**, Almanya



1. Kî bi ruh û can mamoste be, ehemîyeta her tiştî li gorî şagirtên xwe dide - ya şexsê xwe bi xwe jî.

2. *“Min ev tişt kir”*, dibêje hafizaya min. *“Îhtimal tune ye min ew kiribe”*, dibêje anora min û sebat dike wiha. Dawîya dawîn hafizaya min ji ber dadixwe.

3. Ne hêz, lê berdewamîya hestên bala merivên bala çêdikin.

4. Kî xwe bighîne armanca xwe, pê re ji wê zêdetir bi dest bixe.

5. Hin teyrên tawis li ber çavên herkesî per û baskên xwe vedişêrin - û navê anorê lê dikin.

6. Di bin şert û mercên aştîyane de merivê şerûd xwe bi xwe dikeve.

7. Bi prensîbên xwe meriv dixwaze zext û zorê li tevgerên xwe bike yan jî qedr û qîmetê bide wan yan jî sixêfan li wan bike yan jî veşêre -du mirovên xwedîyê heman prensibî îhtimalên tiştên ji kokê ji hev cihê dixwazin.

8. Kî xwe kêm bibîne, pê re ji çavên yê li jor li xwe mêze dike, qedr û qîmetê dide xwe.

9. Ruhekî ku dizane tê hezkirin, lê bi xwe hez nake, zemîna xwe îfşa dike: zemîna wî derdikeve jorê.

10. Felaket e ku meriv di behrê de ji tîbûnê bimire. Hûn mecbûr in hema rastîya xwe tim ewqas zêde xoy bikin, ku ew hema qet nikaribe - nikaribe we’cê jî bişkîne?

# Koma Kovargerên Kurd

Koma Kovargerên Kurd bi hêvîya kovargerên kurd bîne ba hev, bingeheka sazgehiyê bide kovargerîya kurdî, kovargerîya kurdî hem bi sêwirandinê hem bi naverokê bi pêş da bibe û pirsgirêkên kovarên kurdî bi hev ra çareser bike hatîye damezirandin.

## Kovarên Endam




/KovargerenKurd

KovargerenKurd@gmail.com

**The Hall Kurdî**

Endama Koma Kovargerên Kurd e